



Australian Government

COVID-19
VACCINATION

Dozja çaremîna a vaksîna COVID-19

08 Tîrmeh 2022

Zivistan bi gelemperî bêtir enfeksiyonên vîrûsên nefesê, mîna COVID-19, bi xwe re tîne. Ji bo peydakirina parastina herî zêde li dijî COVID-19, na zêdekerek biserra, dozajek çaremîn a vaksîna COVID-19 ji bo keslên ku di xetera nexweşiya giran a COVID-19 de ne tê pêşniyarkirin. Ev yeka wê bibe dozaja pêncemîn a vaksîna COVID-19 ji ew kesên ku bi giranî xwedan qelsîyek parastina bûnyatê ne.

Divê hûn dozaja çaremîn a vaksîna COVID-19 werbigrin heke hûn:

- Temen 50 salî an jî mezintir
- li tesîsên kal û pîran ên lînêrînê ne

Ji bo kesên temen 16 salî û mezintir têye pêşniyarkirin ku ew zêdekerek biserre li xwe bidin ên:

- pergala parastina leştê te lawaz e
- bi şêrpenceyê yî an jî ji şêrpenceyê xilas bûyî
- nexweşiyekê otoîmyûnê te heye ku hewceyê dermankirinê ye
- nexweşiyekê kronîk an giranê te heye ku bandorê li pişik, kezêb, gurçik, mêjî, an dilê te dike
- te diyabetê heye ku pêdivî bi derman heye
- te kêmendamiyek heye û te pêdiviyên tenduristiyên girîng yan aloz heye
- giraniya te pir zêde an kêm e.

Mîrovên temen 30 heya 49 salî ku bixwazin dikarin dozaja xwe ya çaremîn li xwe bidin.

Bi doktorê xwe re bipeye heke tu ne dilniya yî ku divê dozaja çaremîn li xwe bida an na.

Hûn dikarin dozaja çaremîn a vaksîna COVID-19 li xwe bidin heke ku bi kêmasî **3 meh** ji roja bi ser dema we dozaja xwe a zêdeker li xwe dabe derbas bêbe.

Tu dikarî vaksîna xwe ya COVID-19 di heman demê de bi vaksîna înzulenzayê re bistînî.

Eger vê dawîyê ceribana we ya COVID-19 pozîtîf derketiye, tê pêşniyarkirin ku tu berî ku dozê vaksîna COVID-19 ya din bistînî, **3 mehan** bisekinî.



Serdana vir bikin ji bo agahdarîya zêde www.health.gov.au an têlefona bikin bo National Coronavirus Helpline li ser 1800 020 080. Ji bo xizmetên wergêrên belaş vebijarka 8 hilbijêre.